Ronahî — Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ | Jimar :959 | 24 -Nîsan- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165


# 124 salan Berxwedana bi Kurdistanê

Konak, nameya Celadet Elî Bedirxan sala 1933’an ji Mustafa Kemal re nivîsandibû bîr xist û got, Bedirxan di nameyê de gotiye, “Ava behrê bi vexwarinê naqede.”

Di ser weşana rojnameya Kurdistanê re 124 sal derbas bûn ku ji aliyê Miqdad Midhet Bedirxan ve 22’yê Nîsana 1898’an li Qahireyê dest bi weşana xwe kir û bi giştî 31 jimar derketin. Ji sala 1973’yan ve roja weşana Kurdistanê, 22’yê Nîsanê, wek Roja Rojnamevanên Kurd tê pîrozkirin.

Rojnamevanên Kurd bi pêmana 22’yê Nîsanê Roja Rojnamevaniya Kurdî, gotin, çapemeniya kurdî tevî astengî û êrişan jî li ser piyan e.

Dîrokzan û rojnamevan Îsmet Konak, bîr xist ku Rojnameya Kurdistanê bi giştî 31 jimar derxistine, lê heta niha hê jî 2 jimarên wê winda ne.



Konak bi dorê behsa kovara Rojî Kurd, Hawar û yên din ên di dîroka çapemeniya Kurdî de girîng kir û got, weşangeriya Kurdî li dûrî erdnîgariya Kurdan jî dewam kiriye û behsa rojnameya “Ria Teze” ya li nav sînorên Yekîtiya Sovyetê kir.

## ‘Dibin xerîbê nasnameya xwe’

Konak, anî ziman ku di dîroka Tirkiyeyê de Kurdofobiyek heye û got, “Ev kurdofobî, li cihê cih her tim xwe da der. Kurdofobî, di 1925’an de bi Biryarnameya Şerq Islahatê xwe da der. Di xala 13’an a biryarnameyê de tê gotin, ‘Ên kurd, lê li ber Tirkan têkşikiyayî.’ Di vê xalê de behsa Dêrsim, Amedê û bajarên din ên Kurdan tê kirin. Di xala 16’an de jî tê gotin, ‘Divê axaftina bi Kurdî bê qedexekirin û demildest divê Tirkî hînî zarokên keç bê kirin.’ Meta min, şagirta Siddika Avarê ye ku ji bo Tirkî bê hînkirin, ew şandibûn Dêrsimê. Siddika Avar, muhfiza dagirkeriyê ye, ji bo wê, ew şandibûn wê derê.” Konak ji bo vê li ser têgeha “biyanîbûnê [silbûnê]” ya Karl Marks sekinî û got: “Bi vê re dibin xerîbê nasnameya xwe, ji nasnameya xwe sil dibin. Ev, xizmeta hîmê netewedelwetê dike. Bi vê re bişavtin tê întegrekirin. Meta min jî yek ji van mînakan e.”

Konak got, paradîgmaya netewedewletê ya Tirk di salên 1940’î de dewam kiriye û bi kampanyaya “Bi Tirkî biaxive” xebatên bişavtinê dewam kirine û xala siseyan a van xebatên bişavtinê jî di sala 1983’yan de jî qedexekirina weşanên ji xeynî Tirkî bûye. Konak, bi lêv kir ku ev yek bandorek nebaş li weşangeriya Kurdî kiriye û weşangeriya neteweyîbûnê ya bi Hawarê dest pê kiriye îro ro bi Ozgur Gundem, Yenî Ulke, Ozgur Ulke, Azadiya Welat, DÎHA, Ajansa Mezopotamyayê, JINNEWS, Xwebûn, Yenî Yaşamê û gelekên din didome.

## ‘Tirk heman Tirk e’

Konak, li ser zext û zora li çapemeniya Kurd got, “Sala 1994’an rojnameya Ozgur Ulkeyê li Stenbol û Enqereyê bombe kirin. Serokwezîra wê demê Tansû Çîller fermana vê yekê dabû. Nêzî 27 kedkarên Ozgur Gundemê hatin qetilkirin. Di sala 2016’an de ev zext gihiştin asta herî jor. Ozgur Gudem, Azadiya Welat û DÎHA hatin girtin. Ev, dewama ferasета Biryarnameya Şerq Islahatê ne. Tirk heman Tirk e, tenê têla tembûrê guheriye.”

Konak, nameya Celadet Alî Bedirxan sala 1933’an ji Mustafa Kemal re nivîsandibû bi bîr xist û got, Bedirxan di nameyê de gotiye, “Ava behrê bi vexwarinê naqede.” Konak, anî ziman ku çapemeniya Kurdî xwedî keleporeke pirr bi hêz e û Roja Rojnamevanên Kurd li rojnamevanên Kurd ên girtî û yên li derve pîroz kir.

## Li ser şopa Apê Mûsa û Gûrbetelî Ersoz

Nûçegihana JINNEWS’ê Bêrîtan Canozer jî got, rojnamevaniya Kurdî ji Apê Mûsa heta Gûrbetelî Ersoz, xebatên xwe di bin zext û zorê de domandiye:

“Bi êrişan û kuştinan dixwazin me bitirsînin û bitepisînin. Lê em ji dema Apê Mûsayan ve dibêjin: Rastî û heqîqet wê di tariyê de nemînin. Me bi vê dirûşmeyê da rê. Em ê her tim pênûsa Apê Mûsa û Gûrbetelî Ersozê hilgirin û nehêlin bikeve erdê.”



Bêrîtan Canozer, bal bire ser astengiyên li ser rojnamevanên Kurd û got, “Bi destê dadgehan malperên me asteng dikin.”

## ‘Dixwazin çapemeniya kurdî bêdeng bikin’

Edîtorê rojnameya Xwebûnê Mehmet Alî Ertaş jî got, “Ev 124 sal in em dibînin bê ka Kurd xwe û çapemeniyê çawa bi rêxistin dikin. Carnan bi Kurdî, carnan bi Tirkî, lê xizmeta civaka Kurd û azadiya gelê Kurd dikin. Gava em li zext û zorê mêze dikin, em dibînin ku zextên dewleta Tirk bêhtir li ber çava ne. Di salên 90’an de dewleta Tirk hevalên me qetil kirin. Lê piştî AKP bû desthilat, em dibînin ku zext zêdetir bûne. Berê çawa kuştin hebû, niha jî rojnamevanan digirin û heps dikin. Di ser 60’î re rojnamevanên girtî hene û bi vî awayî dixwazin çapemeniyê bêdeng bikin.”

## 31 jimarên Kurdistanê

Jimara yekê ya rojnameya Kurdistanê, 22’yê Nîsana 1898’an, li peytexta Misrê Qahîreyê derket. Miqdad Midhet Bedirxan ew jimar û 4 jimarên din amade kirin û weşandin. Ev rojnameya yekê ya bi zimanê Kurdî ye; xwedî û weşangerê wê jî yekem rojnamevanê Kurdî ye.

Piştî zexta Osmaniyan li ser Misrê, rojnameya Kurdistanê ji neçarî gelek cih guherandin. Bedirxaniyan weşandina rojnameya Kurdistanê li hin welat û deverên Ewrûpayê, mîna Cenevre, London û Folkstonê domand. Hejmarên 1’ê ta 5’an li Qahîreyê, ji ya 6’an ta 9’an li bajarê Cenevre yê Swîsreyê, ji ya 20’an ta 23’yan dîsa li Qahîreyê, hejmara 24’an li Londonê, ji 25’an ta 29’an li Folkistona Başûrê Ingilîstanê û ji hejmarên 30 û 31’ê jî dîsa li Cenevreyê hatine weşandin.

Piştî Mîdhed Bedirxan, Evdirehman Bedirxan xwe da ber barê derxistina rojnameyê, di 47 meh û 22 rojan de, li sirgûnê di rewşeke dijwar de 31 hejmar hatine weşandin. Pênc hejmarên ku Mîdhet Bedirxan diweşîne, ji bilî du daxwaznameyên di hejmarên 4 û 5’an de, hemû bi zimanê Kurdî ne. Di 13’ê Nîsana 1909‘an rojnameya “Kurdistan” ji aliyê Osmaniyan ve hate girtin.

*MA/AMED*


## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bac | Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye. |
| Cirm | Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin. |
| Firîşte | Melek. |
| Koordîne (Fransî) | Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon. |
| Koordînator | Kesê karê koordîneyê pêk tîne. |
| Perû | Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye. |
| Salewext | 12 meh: X. salewext cotkariyê dike. |
| Seranser | Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Seresere | Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike. |
| Rojev | Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | R | A | | A | L | E | M |
| 2 | | K | A | | A | D | A | N | |
| 3 | B | A | Z | Î | D | | V | Î | N |
| 4 | A | W | | L | A | M | A | | Î |
| 5 | | A | B | O | R | Î | | S | S |
| 6 | S | | Î | N | | K | Î | | K |
| 7 | B | E | R | | T | A | | O | |
| 8 | | M | A | K | | P | I | D | Î |
| 9 | T | R | | Ê | K | | R | E | Ş |

## Xaçepirs



### ÇEP-RAST

1. Tiştanok, têderxistinok... Cama mîkroskopê
2. Aşît, şepe, berfende
3. Wekî gijbûna pirça canê ajelan û tiştên wisa... Rehîbê Budayan
4. Hazir... Teref
5. Serokê rûhanî yê xaçparêzan... Kurteya elementa Aktînyûmê
6. Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê... Beşeke malê, jûr
7. Rengek... Hêjmarek
8. Peyveke teşwîqkirinê... Tirsa mezin
9. Bersivan pejirandinê, erê... Pirsek di rewşa ne tewandî de

### JOR-JÊR

1. Teyrên dirinde
2. Dinya, cîhan
3. Paytexta Bolîvyayê
4. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Bi rûsî erê... Bi erebî “ez”
5. Mîrate
6. Peyva neyînî... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Hejmarek
7. Paytexta Perûyê... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê
8. Beyreq, sembola welatan... Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov an jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê tê gotin)
9. Notayek... Hilberîna tiştekî nedîtî

# ‘Bi pênûsa Apê Mûsa emê rastiyan binivîsin û faşîzmê têk bibin’

Derheqê roja rojnemevaniya kurdî (22`yê Nîsanê) de, rojnamevanên Kurd dan zanîn ku di dîroka ragihandina azad de, rûbirûyî gelek zehmetî û zoriyan hatine. Herwiha teqez kirin ku wê li dîjî her rengê zehmetiyê bi pênûsa Apê Musa rastiyê binivîsîn û faşîzmê têk bibin.R-5





Ronahî — Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 959 | 24-Nîsan- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## ‘Ragihandina azad civakeke azad ava dike’

Di salvegera roja rojnemevaniya kurdî de nivîskar û rojnamevan Elî Roj da zanîn ku armanca ragihandina azad pêşxistin û avakirina civakeke azad e. R- 6



# ‘PLANA DEWLETA TIRKÎ Û PDK’Ê QIRKIRINA GELÊ KURD E’



## *Her du alî ne bira ne, yek li hemberî dijmin şer dike yek bi dijmin re êriş dike!

Foza Yûsiv ji bo helwesta gel a li hemberî xiyaneta PDK’ê wiha got: “Helwesta şermezar a rayedarên PDK’ê da nişandan ku pêwiste em weke gelê kurd li hember wan xwedî helwest bin. Em nebêjin her du alî jî kurdin û birane, na yek li hember dijmin şer dike û ya din jî bi dijmin re dibe yek. Biratî û hevaltiyên wiha nabe. Divê em wek gel ji vê yekê re bêjin bese û pêşiya wê bigirin. Divê em ji dijmin û hevkarên wan hesap bixwazin. Bila her kes bizane ku gelê Kurd vê yekê qebûl nake. Ev roj, roja rûmet û berxwedanê ye. Derveyî vê ti çare nînin. Ji bo em careke din sedsaliyeke rezil, bêmaf û bêazadî derbas nekin, dirûşma me ew e ku her tişt ji bo rûmet, azadî, hebûn û nasnameya xweparastinê ye.” R-3

## Berwarî: Dixwazin bi firehiya 50 Km. ji Rojava heta Rojhilat herêmeke dagîrkeriyê çêkin

Kamîran Berwarî da zanîn ku dewleta tirkî û hevkarên wê bi êrişa ser qadên gerîla dixwazin ji Rojava heta sînorê Rojhilat bi firehiya 50 Km. herêmeke dagîrkirî çêkin. Herwiha teqez kir ku dewleta tirkî ji bo pêkanîna vê dagîrkeriyê, ji desthilata Herêma Kurdistanê derfet û hevkariya siyasî, aborî û leşkerî girtiye. R-4

## Banga KCK`ê: Em li gel berxwedana fedayî ya gerîla cih bigirin

KCK’ê bang li gelê Kurdistanê, jin, ciwan û her kesî kir ku li dijî êrişên dagîrkeriyê yên dewleta tirkî ya qirker û mêtinger bi xurtî helwestê nîşan bidin û li gel berxwedana fedayî ya gerîlayên azadiyê cih bigirin, li her cihî berxwedanê xurt bikin. R-4



## Dewleta dagîrker êrişên xwe yên ser rojavayê Kurdistanê zêde kirin

Dewleta tirkî ya dagîrker hemwextê êrişên xwe yên bi hevakariya PDK`ê yên ser qadên gerîla, êrişên ser rojavayê Kurdistanê jî zêde kirin. R-2

## Albûmek ji bo eşqa bêdawî ya Mihemed Şêxo

Xecê: Min xwest wekî arşîvekê, hest û hunerê hunermendê nemir bi vê xebatê bigihînim nifşên nû. Ez bawer dikim ku wê bigihe her dilê hunerhez û heskiriyên Mihemed Şêxo û hunerê wî her û her wê bijî. Gotina stiranên hunermendekî ewqasî serketî ji bo min riya şerefê ye. R-7




## HDP: Li dijî êrişên ser gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin

HDP’ê Roja Rojnamevaniya Kurdî pîroz kir û got, em bang dikin ku li dijî êrişên ser gelê Kurd, li ser esasê weşangeriya parastina maf û azadiya gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin. R-2

## Cejin nêzîk bûye, lê tevgera welatiyan li bazarê kêm e

Her sal bi nêzîkbûna cejna Remezanê re welatî berê xwe didin bazarê, da ku pêdiviyên cejnê bistînin. Lê îsal ji ber krîza aborî, herwiha bilindbûna nirxê dolar û bihabûna pêdiviyan, welatî nikarin weke her sal amedekariya cejnê bikin. R-7



## Odeyeke Baskê ji Sara re

*Li Welatê Baskê, Jineolojî Center û Kulturarteko Plaza Feminista ‘Odeya Sakîne Cansiz’ ava kir. Li vê navendê wê alîkariya jinan bê kirin. R-3*




## 2 ENIYÊN ŞER

Faruk Sakik


*R-5*



## Gelo ez li cem kê bûm!?

Dijwar Ehmed Axa


*R-6*



## PDK nûnera xeta ‘qumsoyî’ ye

Idrîs Henan

*R-4*



# Dewleta dagîrker êrişên xwe yên ser rojavayê Kurdistanê zêde kirin

Dewleta tirkî ya dagîrker hemwextê êrişên xwe yên bi hevakariya PDK`ê yên ser qadên gerîla, êrişên ser rojavayê Kurdistanê jî zêde kirin.

**Navenda Nûçeyan**

Êrişên dewleta tirkê ya dagirker ya bi hevkariya PDK'ê, ku ji bo dagirkirina başûrê Kurdistanê, bênavber didomin. Hemwextê êrişên dagîrkeriyê yên ser bakur û rojhilatê Suriyê jî zêde dibin. Dewleta dagirker îro danê siharê li navenda Kobanê û kolana 24 kir amanc. Herwisa heman êrişkar beriya çendekê carek din avahiyek navenda Kobanê topbaran kir. Hemwextî gundên Til Ajar, Alqemiyê, Meştel û Merenaz ên navçeya Şera ya Efrînê topbaran dikin.

Dewleta dagirker herwiha gundên Eyn Deqnê, Bêlûniyê, Şêx Îsa û Semûqa û Bendava Şehbayê yên kantona Şehbayê topbaran dike û 70 obîs li herêmê xistine.



## HDP: Li dijî êrişên ser gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin

**Navenda Nûçeyan**

**HDP'ê Roja Rojnamevaniya Kurdî pîroz kir û got, em bang dikin ku li dijî êrişên ser gelê Kurd, li ser esasê weşangeriya parastina maf û azadiya gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin.**

Cîgirê hevserokên giştî yên HDP'ê parlamenter Tayyîp Temel bi daxuyaniyeke nivîskî Roja Rojnamevaniya Kurdî pîroz kir û got, Rojnameya Kurdistan lêgerîna heqîqetê ji bo xwe kir bingeh û bû destpêka kevneşopiya çapemeniya azad. Bi vê wesîleyê em bang li derdorên eleqeder dikin ku li rojnamegeriya Kurd xwedî derkevin. Em bang dikin ku li dijî êrîşên li ser gelê Kurd, li ser esasê weşangeriya parastina maf û azadiya gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin
Di daxuyaniyê de ev tişt hate diyarkirin:
"Rojnameya Kurdistanê ku yekemîn rojnameya kurdî ye, di 22'yê Nîsana 1898'an de li paytexta Misrê Qahîreyê ji aliyê Mîqdat Mîdhed Bedirxan ve dest bi weşanê kir. Ji ber vê yekê 22'yê Nîsanê wekî Roja Rojnamegeriya Kurdî tê qebûlkirin.
124 sal berê Kurdistan bi periyoda ji 15 rojan carekê dest bi weşanê kir û bi giştî 31 hejmar hatin weşandin. Rojnameya Kurdistanê ji ber zextên dewleta Osmanî li sirgûniyê dest bi weşanê kir. Bi weşana rojnameya Kurdistanê, bingeha rojnamegeriya Kurd hat avêtin. Rojnameya Kurdistan lêgerîna heqîqetê ji bo xwe kir bingeh û bû destpêka kevneşopiya çapemeniya azad. Rewşenbîriya Kurd li ser bingehê rojnameya Kurdistanê pêş ket. Jiyana siyasî, entelektuel, çand û hunerî ya rewşenbîrên Kurd xwe bi teşe kir. Rêwîtiya ku 124 sal berê îro dest pê kir; her tim bû hedefa desthilatdarên ku bi polîtikayên înkar û îmhayê hebûna xwe berdewam dikin. Hem bû hedefa êrîşên giran, hem jî kirin hedefa êrîşan. Çapemeniya Kurd û kevneşopiya çapemeniya azad, bi bedelên giran û di bin zext û êrîşên zêde de hebûna xwe parast û heta îro hat. Îro jî ji bo ronîkirina civakê û dengê civakê roleke jiyanî dilîze.
Çapemeniya Kurd bi taybetî di salên 1990'î de li gel kuştin, îşkence û girtinê, berdêlên pir giran da. Îro jî bi heman êrîş, zext û astengiyan re rû bi rû dimîne. Lê kevneşopiya çapemeniya azad, li gel tundî, zext û astengiyan, bêyî tawîzan bide, rêça Mîqdat Mîdhed Bedirxan, Mûsa Anter û Gurbetelliyan û kevneşopa wan a têkoşînê berdewam dike.

Çapemeniya Kurd îro di bin êrîş û gefên hîn mezintir de ye. Bi taybetî dixwazin bikin aliyê êrîşên îmhayê yên li dijî destkeftiyên gelê Kurd. Dixwazin bikin amûrê ku xizmeta berjewendiyên desthilatdaran dikin. Medya Kurd ji ber vê yekê bi gef û talûkeyên mezin re rû bi rû ye. Parastina mafê gelê Kurd, esasgirtina azadiya gelê Kurd, fermana mîrateya kevneşopiya ku rojnameya Kurdistanê daye destpêkirin e.
Bi vê wesîleyê em bang li derdorên eleqeder dikin ku li rojnamegeriya Kurd xwedî derkevin. Em bang dikin ku li dijî êrîşên li ser gelê Kurd, li ser esasê weşangeriya parastina maf û azadiya gelê Kurd, parastina heqîqetê bikin. Em careke din bi hurmet û minnetdarî kedkarên çapemeniyê û şehidên çapemeniya azad bi bîr tînin. Em xebatkarên çapemeniya azad ku heqîqetê ji bo xwe esas digirin û Roja Rojnamegeriya




## HPG: Gerîla derb li helîkopterên dijmin dan

**Navenda Nûçeyan**

**HPG`ê ragihand ku dewleta Tirkan ya dagîrker bi piştgiriya PDK`ê li Kurojaro êriş kir û hewl da bi helîkopterên Skorsky hêzên xwe li herêmê bi cî bike. HPG`ê da zanîn ku gerîla hewldanên wan şkandin û derb li helîkopteran dan.**

Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê wiha ye:
"Şeva 21'ê Nîsanê saet 22:36'an 9 helîkopterên êrişê û helîkopterên bi tîpa Skorsky ên artêşa Tirk a dagirker, ji xeta Amediyê-Dêrelok yên di bin desthilata PDK'ê de ne hatin û bombe li qada Kurojahro barandin. Piştî wê hewl dan bi helîkopterên Skorsky hêzên xwe li qadê bi cî bikin. Hêzên me yên li Qada Berxwedanê ya Kurojahro dest li van helîkopteran werdan û derb lê xistin. Artêşa Tirk nîvê şevê 10 helîkopterên din anî û êrişa li ser vê qadê giran kir. Hêzên me dest li van helîkopteran jî werdan û derbeke giran li helîkopterekê xistin. Helîkopterek jî ku dixwest li baregeha Sîrê ya li Şêladizê xwe deyne û leşkerên mirî û birîndar rake, di dema rabûnê de hêzên me lê dan. Helîkopterên artêşa Tirk careke din li ser qadên di bin kontrola PDK'ê de ne firiyan û hatin êrişî Qada Berxwedanê ya Kurojahro kirin. Artêşa Tirk tevî helîkopterên êrişê û helîkopterên bi tîpa Skorsky her wiha helîkoptera bi tîpa Çînok (CH-47 Chinook) a DYE'yî jî di vê êrişê de bi kar anî.Ev êrişên berfireh û giran hem li Qada Berxwedanê ya Kurojahro hem jî li herêma Zapê tê wateya pêl û asteke nû ya êrişa dagirkeriyê. Li vê qadê berxwedana hêzên me yên gerîla û şer bi giranî dewam dikin."



## HPG`ê nasnameyên 2 gerîlayên şehîd eşkere kirin

**HPG'ê nasnameyên 2 gerîlayên 17`ê Nîsanê di êrişên dewleta Tirkan yên ser Herêmên Parastinê yên Medya de şehîd bûyîn eşkere kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê gerîlayên ku di 17'ê Nîsanê de di êrişên dagirker de şehîd bûne, ev tişt diyar kir:
"Li hemberî tevgera dagirker a ku dewleta Tirk a dagirker daye destpêkirin, tîmên gerîlayên gerok derbên herî giran ên di dîrokê de li dijmin dixin. Dijmin qet ne li benda van derban e û xwe ji van derban re amade nekiribû. Hevalên me Agir û Fedakar ên ku pratîkvanên hoste yên vê taktîkê ne, bi berxwedana xwe derbên giran li dijmin xistine. Hevalên me Agir û Fedakar him bi berxwedaniya xwe û him jî bi helwesta xwe ji bo rêhevalên xwe bûne xeta berxwedanê.
Nasnameya hevalên me yên şehîd wisa ye:
Nasnav: Agir Botan
Nav û paşnav: Serhat Sakçi
Cihê jidayikbûnê: Şirnex
Navê dê û bav: Şahiye - Ramazan
Dîrok û cihê şehadetê: 17'ê Nîsana

Nasnav: Fedakar Cûdî
av û paşnav: Alî Îbrahîm
Cihê jidayikbûnê: Kobanê
Navê dê û bav: Cemîle – Ebûzeyt
Dîrok û cihê şehadetê: 17'ê Nîsana 2022'an/ Herêmên Parastinê yên Medyayê



# Cejin nêzîk bûye, lê tevgera welatiyan li bazarê kêm e

Her sal bi nêzîkbûna cejna Remezanê re welatî berê xwe didin bazarê, da ku pêdiviyên cejnê bistînin. Lê îsal ji ber krîza aborî, herwiha bilindbûna nirxê dolar û bihabûna pêdiviyan, welatî nikarin weke her sal amedekariya cejnê bikin.

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

Ji ber daketina nirxê lîreyê Sûrî beramberî dolar, bihayê her tiştî gelek zêde bûye. Ji ber wê jî welatî nikarin weke salên berê pêdiviyên xwe yên ji bo pîrozkirina cejnê pêk bînin. Li ser mijarê welatiyên bajarê Qamişlo û xwediyên dikanan nêrînên xwe ji me re diyar kirin.



**Derfet nîne cilan ji zarokên xwe re bikirim**

Welatiya bi navê Heyfa Hisên diyar kir ku ji ber bihabûna pêdiviyên cejnê û rewşa heyî wê pîrozbayî, herwiha keyf û xweşiya cejnê ne weke salên berê be û axaftina xwe wiha domand: "Her kes dizane ku ji pêwîstiyên cejna Remezanê kirîna şekir û cilên zarokan e. Ev çandeke di nava civakê de ye; kirîna cilan ji zarokan re keyf û xweşî dixe dilê wan. Her sal min cil ji zarokên xwe re dikirîn, lê îsal derfet nînin ku cilan ji wan re peyda bikim. Çimkî ne cilên zarokan tenê, gelek pêwîstiyên cejnê hene."

**'Ji ber ku çavdêrî li ser bazarê nîne bihabûneke bêserûber heye**

Heyfa bal kişand ser bihayê şekirê cejnê û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Îsal kîloyê şekir bûye 20 hezar, yê ku çend kîlo şekir bikire 100 hezar jê re pêwîst in. Em êdî nizanin çi bikin, vê bihabûnê barê gel pir giran kiriye û bûye gotina ser zimanê her kesî. Jixwe kesên xizan êdî nikarin tiştekî bikin.

Heyfa Hisên di daviyê de got, kontrolkirina bihayê pêdiviyan pêwîst e. Da ku gel bikare jiyana xwe baş dserbas bike û cejina xwe weke her sal pîroz bike.



Xwediyê dikana şekiran Mihemed Ebdulkerîm Faris da xuyakirin ku îsal ji ber bihabûnê tevgera welatiyan kême û ev yek li gotinên xwe zêde kir: "Ji ber bilindbûna nirxê dolar û girtina riyan bihayê şekir pir bilnd bûye. Her sal em gelek cûreyên şekir û biskewît û şîranahiyên din dikirin. Tacir li gorî xwesteka xwe bihayê şekir diyar dikin. Ev bihabûn zirar li me û li gel jî dike. Dema tiştek biha dibe em jî êdî nikarin weke berê, kar bikin û astengiyan di karê xwe de dibînin. Îsal ji ber ku şekir pir biha bû min kêm aniye dikanê. Tevgera welatiyan jî kême, kesê ku şekir dikire jî yê erzan dikire. Sala çûyî şekirê ku me bi deh hezaran difirot îsal em bi 14 hezaran didin."
Mihemed Ebdulkerîm Faris di dawiyê de got, rewşa aborî ya gelê herêmê pir lawaz bûye, ji bo wê jî em bi hêvî ne ku şopandineke sererast ji vê rewşê re bê kirin û ji bihayê pêdiviyan re venêrîneke cidê bê kirin.



**'Ez cejnê pîroz nakim tenê sibehan diçim goristana şehîdan'**

Welatiya bi navê Zibêde Xelîl Ismaîl dayîka şehîd Ednan da zanîn ku cejna xwe bi çûna ser gora kurê xwe yê şehîd, pîroz dike û wiha got: "Ez hatime bazarê şekir bikirim da ku li zarokên goristanê kom dibin belav bikim. Îsal şekir pir biha ye. Lê em neçar in bikirin. Ezê şekir ji bo zarokên goristanê bikirim. Ez cejnê pîroz nakim, tenê ezê sibehan biçim goristana şehîdan."

# Albûmek ji bo eşqa bêdawî ya Mihemed Şêxo

**Xecê: Min xwest wekî arşîvekê, hest û hunerê hunermendê nemir bi vê xebatê bigihînim nifşên nû. Ez bawer dikim ku wê bigihe her dilê hunerhez û heskiriyên Mihemed Şêxo û hunerê wî her û her wê bijî. Gotina stiranên hunermendekî ewqasî serketî ji bo min riya şerefê ye.**

Xebata albûmê ya hunermend Xecê, "Guldesteyek Ji Stiranên Mihemed Şêxo", di salvegera koça dawîn a hunermendê nemir Mihemed Şêxo de bi etîketa Ses Media Muzîk li ser platformên dîjîtal belav bû.
Hunermend Xecê di vê albumê de cih daye stranên Mihemed Şêxo yên bi navê "Ay Gewrê", "Nesrîn", "Dinya Bu Bihar", "Ey Felek", "Bilinde Bejn û Bala Te", "Were Were nik min Rûne", "Perwîn", "Dil perîşan im", "Lê lê Ciwanê", û "Xalxalok".
Hozan Xecê, albuma xwe ya "Guldesteyek ji stranên Mihemed Şêxo" wiha pêşkeşî guhdarvanên xwe dike; "Pêşkeşek ji pêşkêşên muzîka nûjen a Kurd Mihemed Şêxo, digel astengiyan hemûyan, bi têgihîştina berpirsiyariyê û bi hûnandina hezkirina bêhempa, wek diyarkirina evîna xwe ya li hember welat û civakê, muzîka Kurdî hûnandiye û welat û civaka Kurd hemû kiriye evîndarê xwe. Mihemed Şêxo, bi hêza şiroveya xwe ya bêhempa ji bo hunermendên biyanî jî bûye çavkaniya hunerî, di warê dildariya welat, dilsoziya nirxan û mirovahiyê, bi xwebexşî bûye remza awazî, bi dilnizmî û keda xwe bûye yek ji pêşkêşê muzîka Kurdî."
Li ser vê albuma wê ya nû em bi Xecê re axivîn.

**Tu dikarî behsa muzîkjeniya xwe bikî, gelo di malbata te de jî muzîkjen hebûn?**

Ez dibêjim, wekî gelek tiştên din kesayetî jî, ji bav û kalan ango ji pêşiyên me weke mîras dimîne ji me re. Ez sala 1978'an li gundekî Cizîrê hatim dinê. Dibe ku eşqa muzîkê jî ji dayîk û bavê min ji min re mabe. Ji ber ku dayika min a rehmetî di ciwaniya xwe de li gund bi dengê xwe jê hatiye hezkirin û di gelek şevbihêrk û şahiyan de stran gotine. Bavê min jî wekî diya min di dema xwe de stran gotine. Di zarokatiya xwe de min xwe tim li ser dikê xeyal dikir û di nava malê de min ji xwe re stran digotin. Sala 1996'an bi naskirina Navenda Çanda Mezopotamya, şaxê wê yê Izmîrê, min xeyala xwe bi cih anî û dest bi xebatên muzîkê kir. Di navbera salên 1996 û 2003'an de di nav xebatan de mam. Sala 2008'an albuma min ya bi navê "Dem", sala 2018'an jî albuma min ya bi navê "Ez û Tu" derket. Piştî çar salan, niha jî albuma ji bo bibîranîna mamosteyê nemir Mihemed Şêxo derket. Wekî din jî rêwitiya min a muzîkê dewam dike.

**Piştî çar salan albuma te ya sêyem derket. Kî ji bo vê albumê çiqasî westiya?**

Piştî çar salan xebata min a sêyem ji bo bibîranîna hunermend û mamostê nemir Mihemed Şêxo, bi navê "Guldesteyek ji stranên Mihemed Şêxo" ya ji 10 stranên wî derket. Album di 9'ê Adarê yanî di salvegera koça wî ya dawîn de derket û niha li ser hemû platformên dijîtal e. Fîrmaya muzîkê ya ku min her sê albumên xwe jî di bin sîwana wê de derxistin, Ses Medya ye û birêz Muhsin Altintop piştgiriyeke gelek mezin û hêja dan vê xebatê. Di bingeh û hûnandina rengê vê xabatê de bêguman keda herî zêde û giranbiha jî ya dost û hevalê min ê hêja Hecî Azad e. Wekî din di berga albume de wênesazê qedirbilind birêz Luqman Ehmed kedeke pirr hêja û giranbuha da. Her wiha dostên qedirbilind Lokman Ayata, di wergera nivîsê de, Mehdî Tanrikulu jî ji bo sererastkirina peyvên stranan kedeke hêja dan. Ji bo mix û mastering, birêz Enver Akarcali, û gelek muzikjenên hêja ked dan ve xebatê.

**Çima guldesteyek ji stranên Mihemed Şêxo?**

Di pandemiyê de em muzikjen ji kar û xebatên xwe yê li ser dikê dûr ketibûn. Rojeke di axaftina min û birêz Muhsin Altintop de fikra vê xebatê derket holê. Wî gote min, gelo em dikarin xebateke bi tevahî ji stranên hunermendên me yên nemir çekin? Ya rastî di dilê min de jî xwestekeke bi vî rengî hebû, lê jê re dem hewce bû. Piştî pirsa Muhsin Altintop bi kêfxweşî min jî fikra xwe got û me biryar da em stranên Mihemed Şêxo hazir bikin. Jixwe, min car caran li ser dikê û ji xwe re li civatan jî çend stranên wî digotin.

**Yanî, tu difikirin ji bo siberojê albumên hunermendên nemir yên din jî hazir bikî!**

Xwezî derfet hebe û em karibin xebatên wekî vê projeyê ji bo bibîranina hunermendên me yên kû ji nav me koç kirine û xizmeta ziman, huner û muzîka Kurdî kirine hemûyan çêkin. Niha tenê li gorî derfetan xebata ji bo mamostê nemir Mihemed Şexo me amade kir. Vê gavê amadekariyek wekî din bi vî rengî tineye. Dibe ku siberojê derfet çêbe, dîsa ji bo bibîranîna hunerê hunermendekî din xebatek bê çêkirin. Bi rastî jî xwendina stranên hunermendên ku di nava guhdaran de bi qedr û qîmet in, karekî zor û zehmet e. Dema ji hin stranan bi deng û şiroveya hunermendekî hatibe hezkirin, bi deng û şiroveya keseke din wê tamê nadê guhdaran. Dizanim karê min gelekî zehmet, giran û hêja ye.

**Bi albumê re Stranên Mihemed Şêxo tesîreke çawa li muzîkjeniya te kir?**

Bêguman di aliyê gihîştina dil û hestewariyê de wekî her guhdarekî tesîrek li min jî kiriye. Bi kesayet, sekn û biryara xwe ya hunerî, di aliyê muzîkjeniya min de jî li ser şirove û xwendina min tesîr kiriye. Ez bawer dikim ku, tişta negihîje dilê stranbêj xwe nagihîne dilê guhdaran jî. Di stranên Mihemed Şêxo de tiştek heye ku ji kûrahiya dil tê û mirov ber bi diyarên dûr ve dibe. Di nav de eşqeke bê dawî heye.

**Ji bo albumê heta xelkê çi got?**

Di hilbijartina van 10 stranan de, min hewl da xwezaya stranan jî biparêzim. Ev album xebateke gelekî nû ye, hêj meheka wê qediyaye. Ji bo fêmkirin û guhdarîkirina hinek xebatan dem hewce ye. Jixwe stranên Mihemed Şêxo di dilê guhdaran da cih girtine û bi qedr in. Lê bi qasî ku di demeke kin de belav bûye jî veger û şiroveyên gelek xweş tên ji guhdaran. Mihemed Şêxo welathezekî gelekî hêja dengekî ji kûrahiya dil û hunermendekî giranbuha yê serdema xwe bû. Min xwest wekî arşîvekê, hest û hunerê hunermendê nemir bi vê xebatê bigihînim nifşên nû. Ez bawer dikim ku ew ê bigihêje her dilê hunerhez û hezkiriyên Mihemed Şêxo û hunerê wî her û her wê bijî. Gotina stranên hunermendekî ewqasî hezkirî û serketî ji bo min riya şerefê ye.



**Gelo bi van stranan te ji xwe re şêweyek ava kir?**

Na ji bo terz û şêwe, ez nikarim bibêjim, min terzek ji xwe re ava kir yan jî ev terza min e. Ji ber ku ev xebat bi tevahî bi hest û hûnandina mamostê nemir û ji bo bibîranina hunerê wî ye. Lê terzekî nêzîkî min e.

**Platformên dijîtal li ser hunermendên Kurd û muzîka wan bandoreke çawa çêkir?**

Belê album niha tenê li ser platformên dijîtal hate weşandin. Êdî cîhan ber bi jiyaneke teknolojîya dijîtal ve diçe. Êdî her tişt li ser medyaya civakî û dijîtal ava dibe. Berê kaset yan jî CD bi gelek zehmetiyan dihatin belavkirin; ji bo ku bigihîjin her deverê xebat û reklameke zêde hewce bû. Lê niha her kes xwedî telefonên destan e û medya dijîtal bi kar tînin. Elaqeyek yan jî hezkirineke wan a hunerî hebe, dema album yan jî xebateke hunerî li ser platform û medya dijîtal hatibe weşandin, guhdarî û temaşe dikin. Medya dijîtal ji bo hunermendan û danasîna xebatên wan ên nû rêyeke baş e. Lê bi xwe re hin xetereyan jî tîne û mirov wexta xwe li wir pûç û vala derbas dikin. Divê mirov van platformên dijîtal baş bi kar bînin.
*Ozgûr Polîtîka*

# ‘Ragihandina azad civakeke azad ava dike’

## Di salvegera roja rojnemevaniya kurdî de nivîskar û rojnamevan Elî Roj da zanîn ku armanca ragihandina azad pêşxistin û avakirina civakeke azad e.

**Darîn Silê/Qamişlo**

22`yê Nîsana 1898`an rojnameya KURDISTAN ya yekê ji aliyê Miqdad Mîthat Bedirxan ve hat derxistin. Ji bo wê her sal 22’yê Nîsanê wek rojeke dîrokî ya ragihandina kurdî tê pîrozkirin.

Ragihandina kurdî di binê deshilat û êrişên dewletên dagîrker de dest pê kiriye. Ji ber wê rastî gelek zehmetiyan hetiye heta ku kariye dengê xwe bigihîne gel. Lê niha bi saya şoreşa rojavayê Kurdistanê, destkeftiyên wê pir pêş ketine û gihiştiye asteke bilind. Herwiha gelek rojnamevan û karmendên ragihandinê li bakur û rojhilatê Sûriyê çêbûne. Herwiha di nava têkoşîna şoreşê de, gelek rojnamevan û xabatkarên çapemeniyê li ser erkê xwe şehîd bûne.

Derbarê mijarê de nivîskar û rojnamevan Elî Roj, roja rojnemevaniya kurdî li tevayiya xebatkar, rojnamevanên çapemeniyê û li şehîdên azadiyê pîroz kir û nêrîna xwe ji me re anî ziman.

Elî Roj da zanîn ku ragihandin eynika civakê ye, bi taybetî Ragihandina Azad wek eynîka heqîqetê pênase kir û wiha got: “Roja me ya îro di cîhanê de ragihandin, bûye eynika çanda, hebûn û rewşa civakan. Bi riya ragihandinê civak dengê xwe digihîne raya giştî. Ji ber wê jî gelek erkên ragihandina azad hene û li beramberî êrişên ku li ser civakê tên kirin wek, şerê taybet, yê piskolojî û yê qirkirina çandî êrkê xwe pêk tîne. Jixwe erkê ragihandina azad ya sereke hişyarkirin û perwerdekirina civakê ye.”

Elî Roj got, armanca ragihandina azad avakirina civakeke azad e. Herwiha ev regihandin ne ragihandineke weke ya sîstemê girêdayî deshilata dewletan e. Ji bo gel kar dike, da ku êş û azarên civakê, çareseriya pirsgirêkan ragihîne cîhanê. Herwiha di perverdekirin û parastina civakê de jî rolê dilîze. Ji bo wê jî ragihandina azad her tim di nava lêkolînê de ye. Da ku rêbazên pêşxistina civakê zêdetir bibin û guhertinek di civakê de çêbe.

### ‘Ragihandina Azad qasî erd û ezman ji ragihandinên din dûr e’

Elî Roj cudahiya navbera ragihandina azad û ragihandinên din de anî ziman û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Ragihandinên derveyî Ragihandina Azad, amûrên sîstemên deshilat in. Fikir û îdeolojiya wan jî ya desthilatiyê ye. Ev ragihandin ragihandineke kole ye û ti caran li milê civakê nesekiniye, her




tim li milê desthilatê ye û tişta ku dewlet bêje li gorî wê ye. Yek ji ragihandinên girêdayî desthilatê, ragihandina dagîrkeriya tirkî ye ku tevayiya bûyer, komkujî û şerê li Kurdistanê berûvajî (manûpûle) dike û tişta li ser civakê tê kirin rawa dide xuyakirin. Mirov ti hêviyê ji van ragihaninan nake. Çimkî ev ragihandinên wisa dûrî exlaq û pîvanên ragihandinê ne. Ji bo wê jî ragihandina azad bi qasî erd û ezman ji ragihandinên din dûr e. Çimkî ragihandina azad ji bo civakê ye û hêz û baweriyê dide civaka xwe.”

### `Erkê ragihandina azad hişyarkirina civakê ye`

Elî Roj behsa erkê ragihandina azad yê derbarê pêşxistin û diyarkirina paşroja Kurdan de kir û wiha pê da çû: “Çawa ku erkê mamosteyan fêrkirin û perwerdekirina xwendekaran e û erkê hunermendan parastina çanda civakê ye, yê siyasetmedaran nûnertiya gel e û erkê şervanan di çeperên şer de parastina civakê ye û hwd. erkê ragihandinê jî ji van tevan zêdetir e. Ji ber ku ragihandin kêm û kurtiyên van û çawabûna karê van tevan radigîhîne raya giştî. Erkê ragihandinê yê sereke jî rêxistina civakê ye. Ji bo wê jî divê bi riya destgehên ragihandinê rastiyên dîrokî baş bên ziman û ji gel re werin xuyakirin. Heriwha paşroja civakê bîr tîne û sîstemên parastina heyî radigîhîne. Herwiha erkê ragihandina azad yê sereke jî li hemberî her xeterê hişyarkirina civakê ye.”




### `Pêwîst e em pêşketin û guhertinên heyî bi destkeftinên şoreşê re mezin bikin`

Elî Roj da xuyakirin ku di nava salên şoreşê de ragihandina azad gelek gav avêtine û wiha dirêjî da axaftina xwe: “ Ragihandina me heta niha jî di rewşeke şer de derbas dibe, asta pêşketinê jî bi kedeke pir mezin çêbûye. Lê eger em vê pêşketinê temam bibînin emê xwe bixapînin. Ji bo wê jî pêwîst e em van pêşketin û guhertinên heyî bi destkeftiyên şoreşê re mezin bikin û vê şoreşê bigihînin asta serkeftinê. Kesê ku cihê xwe di milê ragihandinê de digire, divê bikeve giraniya rastiya êrişên ser gel û erkû xwe li gorî wê pêk bîne. Heriwha xwedî li keda rojnamevanên me yên ku canê xwe kirîn feda derkevin. çimkî di nava şer de jî gelek rojnamevanên ragihandina azad şêhîd bûn. Di salvegera Rojnemevaniya Kurdî de em wan bîr tînin û bejnaxwe li ber wan ditewînin, ew bûn pêşengên vê şoreşê.”

Elî Roj got, pêwîst e kesê ku di ragihandinê de kar bike, dilxwazê karê xwe be. Çimkî rojnamevanî ne tiştekî hêsan e. Divê kesê rojnamevan ti caran xwe temam nebîne û her tim asta xwe pêş bixe. Da ku kêmayiyên heyî nemînin û neyên dubarekirin.

Nivîskar û rojnamevan Elî Roj di dawiyê de, bang li tevayiya xebatkarên çapemeniya azad kir ku li vî karî xwedî derkevin û soza ku dane şehîdan bi cih bînin. Herwiha got, pênûs û kamîreya hevalên ev kar didan meşandin, li erdê nehêlin û bibin şopdarên riya wan. Ya pêwîst ew e ku em xwedî li fikrê Rêber Apo derkevin, ancex xelasiya me bi riya fikrê wî be. Erkê rojnamevanên çapemeniya azad erkekî dîrokî ye û pir giranbiha ye. Eger em erkê xwe pêk bînin emê rehetiyekê di fikrê xwe de jiyan bikin û emê karibin bêjin ku em Rojnamavên Çapemeniya Azad in.



### Gelo ez li cem kê bûm!?

Dijwar Ehmed Axa

Bûyera vê gotarê jî girêdayî min û Apê min Mûsa Enter e. Sala 1989`an dema ez li cem, ji min re wiha got:
Zindan mala min ya duduyan bû, li zindanên Tirkiya pir mam. Carekê demeke dirêj li zindanê mam, nêzî 4 sal û çend mehan. Piştî hatim malê, gundî, dost û cîranan serdana min kirin. Her kesî tiştek bi destê xwe dianî.
Jineke bi navê Helo li cem me li Stilîlê hebû, wê jî eloek xistibû binê çengê xwe û hat serdana min. Min jê re got, Helo, lawo qurban te çima xwe westand, destên te sax bin, lê tu zanî te gelekî li xwe şkandiye û xera bûyî. Berê tu pir xweşik û spehî bûyî. Tê bîra min di daweta mala filankes de, te serê govendê girtibû û dîlan dikir. Helo rasterast li çavên min nêrî û got, Apê Mûsa ez wê demê li cem kîjan mêrî bûm?
Hingî Helo mêr kirbûn ji bîr kiribû bê wê demê li cem kê bûye!.
Îca werin em li rewşa xwe binêrin. Di dema me ya niha de, bi sedan kesên weke Helo çêbûne û bi taybetî kesên qaşo dibêjin em siyasî ne. Her kes dizane ku tevgera siyasî ya kurdî bûye sê beş, yek dibêje em Berzanî ne û li ser rêbaza Mele Mistefa dimeşin. Beşek dibêje em Apocî ne li ser fikir û felsefeya Rêber Ocalan dimeşin. Beşa sisiyan li gorî siyaseta rehmetiyê Mam Celal Telebanî dimeşe. Ev rastiyek e lê mijara me ne ev e, mijara me ew kesên weke Helo ya Stilîlî ya Apê Mûsa behsa wê kirî ye. Weke nanê sêlê ne, her deh rojan li cihekî ne, mirov li wan ecêbmayî dimîne, geh dibêjin em li ser rêbaza Berzanî ne û li dijî Tevgera Azadiyê tişta nemayî dikin. Piştî demekê mirov wan li cem hevalên Apoyî dibîne, dev diavêjin rêbaz û girêdana wan ya bi Tirkan re. Lê ya herî mirov matmayî dike, ew kesên bêpirensîp û bêbawerî ne. Di salekê de tevlî deh partyan dibin û ji wan qut dibin. Bêmebde in, bêexlaq in, bêwijdan in. Gelo me ev ne weke Helo ya Stilîlî ne? Bawer dikim ku Helo ji wan bişereftir bûye, hema wê jixwe re mêr dikir û disitirî, lê ev kesên ku navê xwe dikin siyasetmedar û her deh rojan ji partîyekê diçin yeke din? Ji alyê din ve, ew kesên ku xwe dispêrin dijmin û li dijî gelê xwe şer dikin ma gelo ji xwe napirsin wê ev dijmin çawa bi wan bawer bike piştî ku dibîne xiyaneta wan bi qewmê xwe re? Mînakên vê meselê li cîhanê hene. Dibêjin dema Napolyon derbasî welatê Nemsa (Awusturya) bû, Silav neda serleşkerê Nemsayî û jê re got, kiriya xwe bigire ji bo dagîrkirina welatê xwe te alîkariya min kir. Lê ez silavê li kesê xiyanet li welatê xwe kirî nakim.
Ka em li kesên ku navê xwe dikin (Welatparêz) û ew bixwe li cem dijminê welatê xwe rûdinên binêrin, ma wê çi welatparêzyê bikin gelo!
Hûn bi qedrê Xwedê kin, kesên mîna van mirov çi layiqî wan dibîne ji bilî ku bi grafêta wan daliqîne.



# Foza Yûsiv: Êrşên îro li dijî şervanên azadiyê, êrişên ser nirxên demokratîk in

## Foza Yûsiv derheqê êrîşên dewleta tirkî yên ser başûrê Kurdistanê got, êrîşên îro li dijî şervanên azadiyê, êrîşên ser nirxên demokratîk in. Dijminê me li dijî gelê Kurd şerekî giştî daye destpêkirin, divê em jî berxwedaneke giştî bikin.

**Navenda nûçeyan**

Dewleta tirkî bi hevkariya PDK’ê di 17’ê Nîsanê êrîşî erdê başûrê Kurdistanê kir. Li kêleka van êrîşan hikûmeta Iraqê êrîşî axa Şingalê kir û dewleta tirkî jî her roj êrîşê bakur û rojhilatê Sûriyê jî dike. Welatî li hemberî van êrîşan li her aliyê Kurdistanê û derveyî welat çalakiyên şermezarkirinê li dar dixin û nerazîbûna xwe nîşan didin. Endama Desteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Foza Yûsiv derheqê vê pêvajoyê de ji ajansa nûçeyan JINHA re axivî.

### ‘Plana dewlata tirkî û PDK’ê qirkirina gelê Kurdistanê ye’

Foza Yûsiv êrîşên ku îro dewletên dagîrker li her aliyê Kurdistanê dimeşîne wiha nirxandin: “Ev şerê ku îro li Kurdistanê ji aliyê dewleta tirk û hevkarên wê PDK’ê ve tê meşandin, siyaseta qirkirina gelê Kurdistanê ye. Ev tifaqa herî dawî ya ku di navbera rayaderên PDK’ê û Tirkiyê de çêbûye, encama wê îro êrîşên li ser axa Başurê Kurdistanê, şervanên azadiyê, Şengal û Rojavayê Kurdistanê tê çêkirin. Xêr û dewlemendiya Kurdistanê hatiye pêşkêşkirin, miqabilê qezencên malbatî û qezencîn partîbûnê. Ev yek jî wek civata kurd em nikarin qebûl bikin. Îro kurd li Rojhilata Navîn bûne hêzek, ji bo ku ev hêza lawaz û perçe bibe, ev pilan tê pêşxistin. Hevkariya PDK’ê di nava vê pilanê de, cesaret û hêzek mezin dide dewleta tirk û hêzên ku di nava vê pilangeriya qirêj de cîh digirin. Çawa ku tifaqa Lozan û Sykes Picot, kurd bêmaf, bêazadî û bêwelat hiştin, di heman wextê de ev tifaqa qirêj a niha çêbûye jî, li ser tunebûna nasname û tasfiyeya azadiya kurdan hatiye pêşxistin. Ev peymana nû ji aliyê dewleta tirk, navteweyî û PDK’ê ve çêbûye, destpêka pêvajoya Lozan a nû ye. Ev dîwarên tên lêkirin jî perçekirina Kurdistanê ye. Em xeteriyek mezin li ser her aliyên Kurdistanê dibînin.”

### ‘Hikûmeta Iraqê perçeyek ji vê planê ye’

Foza Yûsif bal kişand ser êrîşên dewleta tirk ji aliyê demografiya Başurê Kurdistanê ve û wiha domand: “Ger îro hikûmeta Iraqê tev hemû saziyên xwe helwest li beramber vê êrîşê daniba, dewleta tirk cesaret nedikir ku êrîşî axa Başurê Kurdistanê bikira. Dibe ku



hin rayedarên Iraqê li dijî vê êrîşê bin û helwesta wan hebin, lê di aliyê biryara siyasî de, di nava vê pilanê de ne. Bi taybet dîwarê ku di navbera Şengal û Rojavayê Kurdistanê de hatiye lêkirin, berdewamiya pilana dewleta tirkan e. Ev pilan bi aqlê dewleta tirk hatiye çêkirin û rayedarên Iraqê jî vê erê kirine û pêk tînin. Tifaqiya Sykess Picot, kurdan kir çar perçe, ereb jî kirin 22 parçeyên dewletan. Îro ev rewşa ku li Iraq û Sûriyê jî tê meşandin, dana rûnişkandina tifaqiya qirêj a sedsala 20’an de hatiye meşandin û nûkirin. Her wiha civaka ereb jî ji hev perçekirin.”
Foza Yûsiv bîranî ku Kesên çeteyên DAIŞ’ê li Iraqê lawaz xistin, Hêzên Sûriya Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê bûn û got, Armanca avakirina vî dîwarî ji bo hem Rojavayê Kurdistanê, hem jî Şengalê lawaz bike, ava dikin. Hikûmeta Iraqê perçeyek ji vê pilanê ye.

### ‘Bila ti kes xwe nexapîne PKK lawaz bikeve, Hewlêr nikare xwe biparêze’

Foza Yûsiv êrîşên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê yên ji aliyê dewleta tirkî ve tên meşandin jî wiha dinirxîne: “Dewleta tirkî li hember Kurdan şerê tunebûnê îlan kiriye. Kurd li kuderê bin, tirk dijminatiya wan dike. Ev şerê ku dewleta tirk, li hemberî gelê kurd îlan kiriye, roj bi roj bi rêbazên cur be cur dewam dike. Îro êrîş li dijî her çar perçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdibin, ev yek perçeyek ji konsepta tasfiye û qirkirinê ye. Êrîşa li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Başurê Kurdistanê konseptek giştiye û di esasa konseptê de ku kurd di nexşeya nû ya Rojhilata Navîn de bê par bimîne. Di heman demê de weke di sedsala 20’an de ji mafê xwe mehrûm bimîne û neçarî bindestiyê bibe. Bila kes nekeve nava xapandinê ku tenê şervanên azadiyê hedefin; hemû gelê Kurd armanca êrîşan e. Di serî de Kerkûk û Hewlêr armancin. Ger tevgera azadiya kurd, lawaz bikeve, Hewlêr nikare xwe biparêze. Êrîşên li ser Rojava tê kirin, êrîşên li ser şervanan tê kirine û her wiha li ser gelê Başurê Kurdistanê ye.”

### ‘Bi erêkirin û sîlehên hêzên navneteweyî gelê Kurd tê qirkirin!’

Foza Yûsiv bal kişand ser berxwedana gel û wiha domand: “Êrîşên li ser gelê Kurd tên kirin, bi erêkirina hêzên navneteweyî tê kirine. Hêzên ku karibe, Rojhilata Navîn demokratîze bike, tevgera azadiya kurd e. Hêza ku dikare Rojhilata Navîn û cîhanê bandor bike, hêzên li Rojavayê Kurdistanê bi pergala Rêveberiya Xweser têkoşîn didin meşandin e. Tevgera azadiya Kurd li Rojhilata Navîn, tevgera herî ku nirxên demokratsiyê, azadiyê û azadiya jin diparêze ye. Şervanên azadiyê li Kurdistanê, hêza herî zêde li hember çeteyên DAIŞ’ê şer kiriye û gelê kurd ji qirkirinê rizgar kiriye. Hêza herî zêde nirx daye mirovatî ye; ger îro şervanên azadiyê nebûna, dê Kobanê, Hewlêr, Kerkûk û Bakurê Kurdistanê di bin bandora çeteyên DAIŞ’ê de bûya. Tevahî cîhan, deyindarê şervanên azadiyê ne. Binketina çeteyên DAIŞ’ê bi bedelên ku şervanên azadiyê daye çêbûye. Êrîşên hovane yên ku îro li dijî şervanên azadiyê rû dide, êrîşên li ser nirxên demokratîk e. Çekên ku îro li beramber me tê şixulandin jî tevahî, ji welatên Ewrûpa tên. Gelê Kurd di bin xeteriya qirkirinê de ye; erkekî mirovahiyê ye û deyîneke li ser hêzên demokratîk ku li dîjî vê qirkirinê rabin û xwedî helwestekê yekpare bin. Divê li her derê çalakiyên radîkal pêş bikevin.”

### “Divê her Kurdê xwedîşeref, piştgiriya şervanên azadiyê bike’

Foza Yûsiv berxwedaniya li hember êrîşên faşîzmê li ser axa Başurê Kurdistanê tê meşandin wiha dirxand: “Tasfiyekirina şervanên azadiyê, tê wateya tasfiyekirina hemû destkeftiyên Kurdistanê. Ji ber ku şervan hêzên parastina mafê jinan, gelan û azadiya jinê ne. Ev hêz nebe, xeteriyên pir mezin derkevin holê. Divê herkes li her derê helwesta xwe nîşan bide. Şervanên azadiyê hêza garantiya, hebûna gelê kurd û yê azadixwaz e. Ji ber tevgera azadiyê, nasnameya kurdî diparêze, ji bo wê ewqas dibe hedef. Divê her kurdekî xwedî şeref, piştgiriya şervanên azadiyê bike. Ev roj, roja rûmeta neteweyî ye.”

### ‘Her du alî ne bira ne, yek li hemberî dijmin şer dike yek bi dijmin re êriş dike!’

Foza Yûsiv ji bo helwesta gel a li hemberî xiyaneta PDK’ê jî ev tişt anî ziman: “Helwesta şermezar a rayedarên PDK’ê da nişandan ku pêwiste em weke gelê kurd li hember wan xwedî helwest bin. Em nebêjin her du alî jî kurdin û birane, na yek li hember dijmin şer dike û ya din jî bi dijmin re dibe yek. Biratî û hevaltiyên wiha nabe. Divê em wek gel ji vê yekê re bêjin bese û pêşiya wê bigirin. Divê em ji dijmin û hevkarên wan hesap bixwazin. Bila her kes bizane ku gelê Kurd vê yekê qebûl nake. Ev roj, roja rûmet û berxwedanê ye. Derveyî vê ti çare nînin. Ji bo em careke din sedsaliyeke rezil, bêmaf û bêazadî derbas nekin, dirûşma me ew e ku her tişt ji bo rûmet, azadî, hebûn û nasnameya xweparastinê ye.”

# Odeyeke Baskê ji Sara re

**Li Welatê Baskê, Jineolojî Center û Kulturarteko Plaza Feminista ‘Odeya Sakîne Cansiz’ ava kir. Li vê navendê wê alîkariya jinan bê kirin.**

Li Welatê Baskê, Jineolojî Center û Kulturarteko Plaza Feminista ‘Odeya Sakîne Cansiz’ ava kir. Li vê navendê wê alîkariya jinan bê kirin.
Li Welatê Baskê li aliyê Spanyayê dagirkirî, li gundê Hernani yê herêma Gipuzkoayê ‘Kulturarteko Plaza Feminsta’ (Warê Pirrçandî yê Femînîst) bi karê jinan radibe.
Li vê navendê ji alîkariya psîkolojîk heta bi alîkariya jinên penaber, dersa zimanê Baskî û gelek atolyeyên hene.
Li vê navendê odeyên xebatê hene ku navên jinên pêşeng û naskirî li wan hatine kirin: Odeya Rosa Parks, Odeya Emma Goldman, Odeya Berta Caceres.
Niha jî endamên Jineolojî Center û xebatkarên Kuturarteko Plaza Feminista civiyan û projeyên xwe dan naskirin. Yek ji wan projeyan jî ragihandina Odeya Sakîne Cansiz bû. Li vê odeyê li gel danasîna jiyan û têkoşîna Sakîne Cansiz, her wiha ji gelek aliyan ve wê xizmet ji jinên li herêmê re bê kirin.

Xebatkara Kulturarteko Plaza Feminista, Kattallin li ser mijarê got, “Tevgera Jinên Kurdistanê hevalbenda me ye. Em ji têkoşîna wan sûdê werdigirin. Têkoşîna Jinên




Kurdistanê ji bo jinên cîhanê gelekî girîng e.”
Kattalin bi bîr xist ku Sakîne Cansiz ji pêşengên Tevgera Jinên Kurdistanê ye û wan jî bi lêkirina navê Sakîne Cansiz li odeya xwe ya xebatê, xwestiye hem têkoşîna wê bidin naskirin û hem jî bikin ku mirov sûdê ji dîroka jinên Kurd wergirin.
***ANF***

# Berwarî: Dixwazin bi firehiya 50 Km. ji Rojava heta Rojhilat herêmeke dagîrkeriyê çêkin

Kamîran Berwarî da zanîn ku dewleta tirkî û hevkarên wê bi êrişa ser qadên gerîla dixwazin ji Rojava heta sînorê Rojhilat bi firehiya 50 Km. herêmeke dagîrkirî çêkin. Herwiha teqez kir ku dewleta tirkî ji bo pêkanîna vê dagîrkeriyê, ji desthilata Herêma Kurdistanê derfet û hevkariya siyasî, aborî û leşkerî girtiye.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Hevpeyvîna rojnameya me bi endamê Kongereya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Dr Kamîran Berwarî li ser êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser qadên gerîla, siyaseta Iraqê û PDK`ê wiha ye:

**Ji 17`ê Nîsanê ve dewleta tirkî ya dagîrker êrişeke dagîrkeriyê ser başûrê Kurdistanê da destpêkirin, hûn vê êrişê çawa dinirxînin?**



Bêguman ji destpêka salên 83`î ve êrişên sîstematîk yên dewleta tirkî ya dagîrker ser başûrê Kurdistanê û tevgera azadiyê dest pê kiriye, ev êriş jî dewama wan e. Lê diyar e ku hem êrişên sala 2020`an, hem yên sala 2021`ê, hem yên niha bi awayekî hê sîsetamtîk, bi armancên stratîjîk pêk tên. Bi êrişa ser qadên gerîla, dixwaze herêma Berwarî ku di navbera sînorê bakur û başûrê Kurdistanê de ye, dagîr bike; xeteke dagîrkeriyê ji bakurê Sûriyê ve heta sînorê Rojhilat bi firehiya 50 Km. saz bike. Ji aliyê din ve AKP-MHP dixwazin qeyrana xwe ya navxweyî û navneteweyî, bi riya vê êrişê veşêrin. Lê projeya bingehî ya wan ew e ku, nexşeyeke nû ya dagîrkeriya Kurdistanê bi giştî dîzayn bikin; Tevgera Azadiyê li her çar parçeyên Kurdistanê ji holê rakin û di encamê de, destkeftiyên gelê Kurd ji holê rakin. Ev jî di pişt perdeyê de bi piştgirya hêzên navxweyî yên Kurdî, herêmî û navneteweyî tê kirin.

**Berî êrişan, civînên eşkere û veşartî di navbera Tirkiyê, PDK û Iraqê de çêbûn, rola aliyên civînan di êrişan de çi ye?**

Dewleta tirkî ya dagîrker ev demek e xwe amade dikir ku êriş bike. Herwiha hemwextê krîza Ukaryna bike ku bêdengiya cîhanê bi dest bixe. Dema êrişê pêwendî bi hilbijartinên Başûr ve heye ku aliyên êriş û civînan naxwazin hilbijartin pêk bên. Di heman demê de hilbijratinên Tirkiyê hene ku êrişkar wisa dihizrin xwe wek bêqeyran û serketî nîşan bide. Jixwe parçebûna birayara Iraqê ya siyasî ji berjewenidiya wan e. Rast e tevgereke siyasî bi navê dîplomasiyê hebû, lê ya rast di navbera Tirkiye, hikûmeta herêma Kurdistan û Iraqê de proje û peymanên istxabarî û leşkerî û aborî dihatin gotûbêjkirin. Dixwazin nexşeya Kurdistanê hê parçe bikin, her parçeyekî bikin çend parçe. Soz jî dane van hêzên Kurdî yên hevkarên Tirkiyê, ew parçeyên ji aliyê wan ve bên girtin. Ji ber heman hêz pir jidil dixwazin Rojava û Başûr bên dagîrkirin. Da ku wek çete di binû sîwanan dewleta tirkî ya dagîrker de bin. Yê ku vê planê pûç dike jî Tevgera Azadiya gelê Kurd e. Ji ber wê dizanin ku heta PKK û îdolojiya Rêber Ocalan hebe wê nikaribin vê projeyê bi ser bixin. Ji ber vê êrişkar ne dewleta tirkî tenê ye, êrişeke piralî ye, hêzên kurdî û dewletên cîhanî beşdarî wê ne. Ya piralîbûna êrişê û vê projeyê teqez dike ew e ku hemwext li seranserê Kurdistanê, Şingal, Rojava û Başûr êriş tên kirin. Lê êriş girantir li ser qadên gerîla ne. Lewra ew bixwe dizanin ku gerîla hêza yekane ye ku destkeftiyên neteweyî bi dest xistine û niha wan diparêze.

**Hûn hevkarî û rola PDK û Iraqê di vê êrişê de çawa dinirxînin?**

Hikumeta Herêmê ji dagîrkirina dewleta tirkî ya Başûr razî ye. Bi tevayiya derfetên siyasî, aborî û leşkerî hevkariya dagîrkeran dike. Bi vê helwestê peyamekê dighîne her kurdî ku ew nikare hebûna xwe bê dagîkeran biparêze. Lewra di nava 31 salên desthilatiya xwe de nikarî leşkerek, asyîşek, aboriyek, siyasetek û perwerdeyeke Kurdistanî ava bike. Her tim xwe diavêje bextê dagîrkeran, hêza xwe ji wan digire, ji Îran bigire, heta Sedam û niha dewleta tirkî ye. Bêdengiya Iraqê ji ber hebûna peymanên veşartî di navbera hin hêzên sunî û hin aliyên Iraqî û Tirkiyê de hene Ku gelê Kurdistanî teng bikin û di encamê de bang li vegera artrîşa Iraqê ji aliyê wan bibe. Artêşa Iraqê jî ji Zaxo heta Xanqîn bi cî bibin. Li hemberî bicîbûna wê, Tevgera Azadiyê di sêgoşeya Bakur, Başûr û Rojava de têk dibin. Di encamê de jî tiştek bi navê herêma Kurdistanê namîne.

**Li gorî nirxandinên we kirîn, konsepteke êrişên piralî li ser Kurdistanê heye, peyama we ji gelê Kurd û partiyên kurdî re çi ye?**

Em bang li tevayiya partiyên kurdî dikin ku xwedîhelwsteke xurt bin. Lewra Kurdên biwijdan, namûs û exlaq -heman tişt ji bo partiyan siyasî yên Kurdistanî jî derbasdar e- hebin wê helwesta wan li vir diyar bibe. Kurdên li hemberî vê dagîrkeriyê ne xwedîhelwest bin, ew alîgirên dagîrkeriyê ne. Ji ber wê divê bi yek helwestê, bi rawstandineke dîrokî xwe bidin pêş li hemberî vê pêvajoya hesas. Pêdivî li ser asta giştî Kurdistanê civîn bên kirin. Li Bakur û Başûr û Rojava û Ewropa sengerek li hemberî dagîrkeran û Hesen Xeyrî (Sembola Xiyanetê), sengera berxwedanê bê avakirin û li kêleka şervanên Azadiyê rawestin. Teqez wê di encamê de serkeftina gelê Kurd misoger bibe. Erdogan û dewleta tirkî jî wê weke Osmaniyan ji nexşeya cîhanê rabin. Jixwe gelê Kurd niha jî ne bêalarntîf e, ew xwediyê îdeolojî û hêzeke mezin e. Kurdên di xeta dijmin de jî wê li hemberî gel û dîrokê rûreş bibin.

# Banga KCK`ê: Em li gel berxwedana fedayî ya gerîla cih bigirin!

**Navenda nûçeyan**

KCK'ê bang li gelê Kurdistanê, jin, ciwan û her kesî kir ku li dijî êrişên dagîrkeriyê yên dewleta tirkî ya qirker û mêtinger bi xurtî helwestê nîşan bidin û li gel berxwedana fedayî ya gerîlayên azadiyê cih bigirin, li her cihî berxwedanê xurt bikin.

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Navenda nûçeyan

KCK`ê da xuyakirin ku şerê tinekirinê ku dewleta tirkî ya mêtinger qirker ji bo desteserkirina destketiyên gelê Kurd, şkandina îradeya berxwedanê û azadiyê ya Kurdan û tinekirina hebûna Kurdan daye destpêkirin, bi 14'ê Nîsana 2022'an êrişa li ser Zapê re derbasî qonaxeke nû bû û da zanîn ku Dewleta Tirkan bi vê êrişa nû re dixwaze îradeya berxwedanê ya hêzên azadiyê yên Kurd bişikîne, Tevgera Azadiyê tasfiye bike û polîtîkaya qirkirina Kurdan temam bike. Di dewama daxuyaniyê de got, em bang li gel û jinên Kurdistanê yên welatparêz, ciwanên Kurdistanê yên şoreşger û welatparêz, gelên Rojhilata Navî, dostên gelê Kurd û raya giştî ya demokratîk dikin ku li dijî êrişên dagîrkeriyê yên dewleta Tirkan ya mêtinger qirker bi rengê herî xurt helwestê nîşan bidin, li gel berxwedana fedayî ya gerîlayên azadiyê cih bigirin û li her derê têkoşîn û berxwedanê mezin bikin.

KCK`ê da zanîn ku gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê li dijî êrişên dewleta Tirkan ya mêtinger qirker bi rengê fedayî dest bi berxwedanê kirin û derbên giran li dijminê dagîrker xistin. KCK`ê got, em gerîla û fermandarên HPG û YJA Starê ji ber vê berxwedana wan ya bi lehengî silav dikin û ji dil pîroz dikin. Hevriyên xwe yên bi lehengî li ber xwe dan û şehîd bûn bi rêzdarî, heskirin û bi minet bîr tînin.

KCK`ê diyar kir ku gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê her tim êrişên dijmin yên dagîrker qirker bi berxwedaneke fedayî şkandine, planên dijmin yên ji bo şkandina îradeya azadiyê ya Kurdan û tinekirina hebûna Kurdan pûç kirine. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê herwiha bi qasî ku planên dijmin yên faşîst mêtinger qirker pûç kirine, di heman demê de ji aliyê mezinbûna îradeya azadiyê ya kurdî û pêşvebirina wê de bûne hêza bingehî.

Hêzên navneteweyî çavê xwe ji êrişan re digirin

KCK`ê bal kişand ser rewşa hêzên navneteweyî û got, divê baş were zanîn ku dewleta Tirkan bi piştgiriya ji hêzên navneteweyî girtî, van êrişan dike. Lewra



eger hêzên navneteweyî piştgirî nedana û çavê xwe ji vê re negirtibûna, wê dewleta Tirkan nikaribûya êriş bike û çekên kîmyayî bi kar bîne. KCK`ê herwisa bîr xist ku hêzên navneteweyî yên li dijî şerê li Ukrayna bûn, li hemberî êrişên dagîrkeriyê yên dewleta Tirkan bêdeng dimînin û got, divê gelên dinyayê û raya giştîya demokratîk van rastiyan bibînin. KCK`ê herî dawî got, em bang li her kesê li hemberî êrişên dagîrkeriyê yên dewleta Tirkan bêdeng dimîne û piştgiriyê dide êrişan divê dev ji vê helwesta xwe ya li dijî demokrasiyê berde û li hemberî vê dagîrkeriyê helwesta xwe zelal bike.

FENER



## PDK nûnera xeta 'qumsoyî' ye

**Idrîs HENAN**

Diyar e ne tenê Tirkiyê, Rûsya û gelek aliyên dîtir di pêşbirka çetetî û qursantiya global a hişmendiya terorîst de ne. Ji xwe di bineya avaker û dendika sîstema dewletê de, kirêtiyek bi salan hatiye nixumandin heye. Sîstem an jî tevgerên ku dixwazin ber bi wê tova desthilatdariyê ve biçin û li dora cewherê wê xeyalên xwe bidin avakirin, bi awayekî tekûz ji wê kirêtiyê re dibin çopgeh û serguyên herî rezîlane. Di vê meydana pêşbirikwar de, hemû aliyên otorîter, li gorî berjwendiya giştî na, li gorî berjewendiya .teng a çîna hikumraniyê tev digerin

Ji lewra aliyek mîna Tirkiyê li rex rejîma desthilatdar a Sûriyê, ve guheriye jêder û volkana xwînê li Sûriyê û bi sedhezaran şêniyên vî welatî tûşî mirin, koçberî û terorê kirin. Îro jî bê perwa ne şerm û ne fedî behsa têkîliyên bi rejîma Sûriyê re dike. Ango; dem hatiye ku îro ji ber pêxîrtengiyên hevbeş ên serdestan, itîfaqa nepenî ya li dijî vîna gelan a weke peymaneke desthilatdaran a hezarê salan e, .were eşkerekirin

Ji bona wê jî amadekariyên dûrûdirêj hatine kirin. Kurd jî di meqseda wan a yekemîn de ye ku bê tunekirina wan ti projeyeke .mêtingeriyê nikare jiyanî bibe

Çîroka vê hevkariyê komplowar e. Her rûdan, buyer û çalakiyên hevbeş bi komployê re dest pê dikin. Tabloyên cuda cuda yên dijatiyê ku carcaran bi ser avê ketine, nekarîne me bixapînin. Ancax tenê kesên di bin sîwana kurtêlxwariya hundirîn de şil bibûn û berê xwe dan sîwan kun a faşîzma Tirkiyê, bihatana xapandin ku ji azweriyên wan re bûne şal !û şepik

Tirkiyê aliyê hebûnî ve misyoneriyek li ser bingeha çewsandinê xwe bi hêz dike. Bi rêbazên tuneker û qirker balansa hebûna xwe dide avakirin. Li her derê ewan û "Qumsoyên" Beko dane avakirin û çandin ku bê wan nikare bihostekê jî biavêje. Tevger û xeta "Qumsoyî" paralelî xeta azadîxwaz meşandiye û li hemberê jî daye şerkirin. Ji bona xeyalên xwe, bi derbên xeta îxanetwar, hewl daye lebitîn û tevgera gelan a serwextbûna azadiyê felc û ji nav bibe. Çendîn tayên spî û reş ji hev hatibin derxistin, îroj herdu tezên şoreşger û îxanetê jî bi zelalî ji hev hatine der. Ji lewra em dibînin; çiqas dîplomasiya çareserker a xeta azadiya gelan bi pêş bikeve, ewqas lihevkirina xeta kurtêlxwar a hundirîn bi neyarên bav û kalan re zêde dibe. hemahengiya di navbera herduyan de ewqas eşkere dibe ku êdî ji hev nayên der û buhayê .herduyan jî yeksan dibe

Ev yek objektîv dagirker, kurtêlxwar û neyaran li hemberî xeta têkoşîna gelan tîne yek pozisyonê. Bi gotinek hê zelaltir; dema ku em îro li dorpêça rejîma Sûriyê û Îranê ji Şehba û herdu taxên Helebê Şêx Meqsûd û Eşrefiyê mêze bikin, êrişên hikûmeta Al-Kazimî li dijî Şenalê û destwerdana faşîzma Tirk ji axa Başûrê Kurdistanê re binêrin, em dê wê hemahengiya dagirkeran ferq bikin. Eger em nêzîkatiya PDK li vê tabloyê zêde bikin, dê baş xuya bibe ku ti ferqek di navbera wê û tabloya dagirkeran de nîne. Berojavî, parçeyek koşeya wê ya herî kirêt û rezîlane .ya beloq e

Mirov weke encam dikare bibêje xeta ku



# 'Bi pênûsa Apê Mûsa emê rastiyan binivîsin û faşîzmê têk bibin'

Derheqê roja rojnemevaniya kurdî (22`yê Nîsanê) de, rojnamevanên Kurd dan zanîn ku di dîroka ragihandina azad de, rûbirûyî gelek zehmetî û zoriyan hatine. Herwiha teqez kirin ku wê li dîjî her rengê zehmetiyê bi pênûsa Apê Musa rastiyê binivîsîn û faşîzmê têk bibin.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Rojnameya KURDISTAN cara yekê 22`yê Nîsana 1898`an li Qahîra Misrê ji aliyê Miqdad Mîthat Bedirxan ve tê derxistin. Ew roj jî wek bûyîna ragihandina kurdî di dîrokê de tê nirxandin û Roja Rojnameya Kurdî tê nirxandin. Lê di nava 124 salan de bênavber qada ragihandina kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê rastî astengî û êrişên dewletên dagîrker, (Tirkiye, Sûriye, Iraq, Îran) hatin.

**'Tirkiye girtîgeheke mezin ya rojnamevanan e'**

Rêxistana Nûçegihanên Bêsînor ya parastina rojnamevanan li cîhanê, di raporên xwe de Tirkiyê wek tirtîgeheke mezin û bêewle ji bo rojnamevanan dinirxîne. Lewra li gorî heman rêxistinê, Tirkiye sala 2021`ê ji 180 welatan di rêza 153`an de ji aliyê binpêkirina mafên rojnamevanan û azadiya çapemeniyê, cî digire. Herwisa di rêza yekê de li ser asta cîhanê ji aliyê dozvekirina li hemberî rojnamevan û destgîrkirina wan cî digire. Para ragihandina kurdî jî di van binpêkirinan de ya herî mezin e.

**`Li bakurê Kurdistanê, ragihandina kurdî rûbirûyî revandin, işkence, kuştinê û şerê taybet tê`**

Bi pêmana Roja Rojnameya



Kurdî û li ser rewşa ragihandina kurdî ya li bakûrê Kurdistanê û Tirkiyê, rojnamevanê ji bakurê Kurdistanê Aslan Aslan ji me re axivî.

Aslan zor û zehmetiyên rojnamevanên Kurd tê de derbas bûyîn bîr anî û wiha got: "Ji destpêka salên 1990'î ve ragihandina kurdî li Bakur di qonaxeke girîng û zehmet re derbas bû, lewra li dijî sazî û xebatkarên wê êrişên giran hebûn. Ji her alî ve rojnamevan rastî revandin, işkence û kuştinê dihatin. Bi desthilatdariya AKP`ê re polîtîkayeke sîstematîk ya dijber li dijî ragihandina kurdî dest pê bû. Lewra hikumeta AKP-MHP'ê bi çeteyan re, li dijî rojnamevanên kurd jî şerekî taybet dest pê kir. Her carê li ser Ragihandina Azad êriş dikir da ku bêdeng bikin. Ji ber wê derveyî ragihandina azad îro li Tirkiyê tevayiya kanalên televizyonan, ajans û rojnameyan ketine binê kontrola AKP-MHP'ê. Herwiha ev sazî û kesên ragihandinê bûne amûrên deshilatê û yên berûvajîkirina rastiyê. Lewra faşîzm dixwaze gel û rastiya heyî bi bêdengiyê bifetisîne."

**`Bi pênûsa Apê Mûsa emê rastiyan binivîsin û faşîzmê têk bibin`**

Aslan teqez kir ku ji bo rastiyê bighînin ber destê gel, berdêlên mezin hatin dayîn û tên dayîn, bi vê peyamê axaftina xwe qedand: "Dema tu bikarî di nava rewşa faşîzmê de vî karî bikî, tu serkeftî yî. Dema kesek dest bi karê rojnamevaniyê dike dizane ku berdêlên wê hene; dibe ku bê girtin, işkencekirin, revandin û kuştin. Lê tevî vê jî vî karî dipêjirinên û dikin. Ev kar di heman demê de karekî şoreşgerî û welatparêziyê ye, berpirsiyarî û berdêlan dixwaze. Îro ragihandina kurdî li Tirkiyê pêşengiyê ji çapemeniya azad re dike û li kû derê neheqî û zilmek hebe rojnamevanên ragihandina azad li wir in. Li ser vî bingehî ew pênûsa Apê Mûsa ji me re hiştî, wê bi destê rojnamevanên azad rastî bên nivsandin."

**Başûrê Kurdistanê, binpêkirin û kuştina rojnamevanan**

Herwisa Iraq û başûrê Kurdistanê di navê de ji aliyê azadiya rojnamevantiyê li gorî heman rêxistinê li ser asta cîhanê di rêza 162`yan de ye. Herwisa li gorî Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê, di sala 2021'ê de, li başûrê Kurdistanê ji aliyê deshilata PDK'ê ve 17 rojnamevan hatin destgîrkirin, 31 rojnamevan jî, pîşeya rojnamevantiyê lê hat qedexekirin. Bi giştî 187 binpêkirinên cuda li hermberî rojnamevanan pêk hatin. Herwiha li başûrê Kurdistanê di nava çend salan de bi dehan rojnamevan hatin revandin û kuştin; mîna kuştina rojnemvan Soran Mam Heme sala 2008`an, Serdeşt Osman sala 2010`an, Kawa Germiyanî sala 2013`an, Wîdad Hisên sala 2016`an Şûkrî Zeyndîn sala 2016`an, Amanc Baban û hevjîna wî Lana Mihemed sala 2019`an de hatin kuştin. Tevlî wê jî Hikumeta Herêmê heta niha kujer diyar nekirine. Ya balkêş ew e ku tevayiya van rojnamevanan, berî bên kuştin rexne li siyaseta hikumetê kiribûn!

**`Li Başûr destgîrkirin û kuştina Rojnamevanan sîstematîk û biramanc e`**

Li ser rewşa ragihandina kurdî ya başûrê Kurdistanê jî rojnamevanê serbixwe Hoş-



yar Cemal ji me re ev agahî parve kirin: "Li Başûr ragihandina azad û ya serbixwe ji ber gefên desthilat û hevparên wê yên aborî û ewleyî tê astengkirin. Heta radeyeke ne zêde li herêmên YNK`ê ji bo ragihandina azad derfet heye. Lê li tevayiya herêmên PDK`ê şer û êrişeke mezin û sîstematîk li hemberî rojnamevan û ragihandina azad tê kirin. Jixwe Desthilat di dîrokê de bi êrişa ser rojnevanan û bi kuştina wan navdar e. Di van salên dawî de jî desthilat ji bo veşartina gendelî, siyaseta xwe ya şkestî û ya li dijî gelê Kurd, şêwazeke nû li hemberî rojnamavanan bi kar tîne. Bi qanûna xwe wan destgîr dike û navê terorê li wan dike, mînaka wê jî Rojnamevanên Behdîna ne. Bi van kiryaran dixwaze herêmê bêdeng bike û çavkaniya gel ji holê rake."

**`Kirêdarkirin û bênirxkirina rojnamevanan siyasta desthilata PDK'ê ye`**

Rojnamevanê Başûr herwisa eşkere kir ku sîstema weşana kanalan ya navxweyî di destê Desthilatê de ye û rê nade kanalên mîna Stêrk, Aryen û Ronahi ku weşana xwe li herêmên vê deshilatê bikin û axaftina xwe wiha domand "Deshilata başûrê Kurdistanê, li hemberî rojnamevanan siyaseteke qirêj dimeşîne, bi pereyan wan dikire û wan bênirx dike. Herwisa jinê bi rengê madeyeke bazirganî bi kar tîne li ser ekranên xwe. Ji ber wê civak bi çavekî piçûk li rojnemvanan dinêre."

**`Rûdaw û K24 ziman û berdevkên dagîrkeriyê ne`**

Hoşyar diyar kir ku medya desthilatê di serî de kanala Rûdaw û K24, di çarçoveya berjewendiyên partî û kesayetên desthiltdar de kar dikin û kêmayiyên heyîn û rewşa rast ya civakê ranagihînin û bi vê nirxandinê axaftina xwe qedand: "Jixwe ev kanal bi pereyên pertrol, seweta vî welatî û gelî ava bûne. Lê ji bo kesayet û malbatan desthilatdar propagenda û kar dikin. Heman ragihandin siyaseteke li dijî gelê Kurd ji bo reşkirina têkoşîna wî li her çar parçeyan bi kar tîne. Mîna cangoriyên gelê Kurd û PKK`ê bi xweşmir bi nav nake. Herwisa li ser ekranên xwe, êrişkarên nirxên gelê Kurd pêşwazî dikin. Bi vê yekê dibin ziman û berdevkên dagîrkeran. Herwisa têgihiştineke şaş li cem gelê Kurd li başûr û tevayiya Kurdistanê ava dikin, lewra mijarên bêkêr li ser ragihandinê gotûpêj dikin û armanca wan jixwe dûrxistina gelê Kurd ji nirxên wî ye".



## 2 ENIYÊN ŞER

**Farûk SAKIK**

Şerê her kes li bendê bû dest pê kir!

Salek berê dijminê Kurdan bi artêş û teknîka xwe ya herî nûjen hatibû û têk çûbû. Îro çi bû ku careke din dest bi êrişên dagîrkeriyê kir? Li gorî agahiyên bi dest dikevin hin hêzên herêmî û navneteweyî jî piştgiriyê didin van êrişên dewleta dagîrker.

Ji şerê par hetanî îroj çi hat guhertin: Di şerê cîhanê yê sêyem de eniya Ukranya derket holê. Dewleta Tirk ji vî şerê eniya Ukranya sûd wergirt û ji bo êrişkirina kurdan wek qozek bi kar anî. Di serî de NATO û Amerîka bi erênî bersiv dan Tirkiyê da ku êrişî kurdan bike. Dewleta Tirk a dagirker ji vê yekê cesaret girt û di 17'ê Nîsanê de şer da destpêkirin.

Em vegerin ka Tirkiye bi vê êrişa dagirkeriyê çi hedef kiriye:

1-Dixwaze di vî şerî de, ji têkçûna xwe, serkeftineke mezin bi manşetên rojnameyan derxe da ku peyamek bide nijadperestên Tirkiyê. Bi vê yekê wê her aliyê qeyrana aborî, siyasî û civakî bide jibîrkirin. Di atmosfereke wiha de here hilbijartinan û desthilatiya xwe bidomîne.

2- Dixwaze xeyalên xwe yên sedsalî yên Mîsakî-Mîlî an jî neo-Osmanî pêk bîne. Di nav van sînorên mîsakî-mîlî de Başûrê Kurdistan, Mûsil, Kerkûk, Şengal û rojavayê Kurdistan jî heye.

3- Plana tinekirina Kurdan a sedsalan pêk bîne. Destketiyên kurdan ên 40 salên dawî ji hole rake.

Baş e, ji bo van planên xwe pêk bîne çima gerîla wek tehdîtek dibîne? Çima di destpêkê de gerîla ji xwe re dike hedef? Gerîla hêza parastina Kurdistanê ye. Bi PKK'ê û Rêber Apo re Kurdistan azad bû. Ev hêz destûr nade ku destketiyên kurdan ên 40 salên dawî, tune bibin. Diparêze. Dijmin baş dizane dema qirkirina kurdan pêk bîne û heger ev hêz-gerîla û ev Rêber hebe dikare Kurdistanek azad ji nû de ava bike.

Em vegerin şer. Berî ku êvara 17'ê Nîsanê şer dest pê bike, hêzên PDK'ê li herêmê ji bo dijmin amadekariyeke mezin kiribûn. Piştî van amadekariyan, dijmin bi balefiran esker danîn herêmên dibin kontrola PDK'ê de.

Gerîla îroj li 2 eniyan şer dike. Li aliyek li dijî dijmin şer dike û li aliyê din jî ji bo hevkariya PDK'ê ya dewleta Tirk re bide seknandin têdikoşe.

Aha.. li vê derê kurdên azad divê bikevin dewrê. Gerîla Kurdistanê diparêze û divê kurdên azad jî gerîla biparêzin.

Raste gerîla xwe ji dijmin diparêze û em jî bûne şahidê lehengiya wî.

Lê, ji bo ku barê gerîla were sivik-kirin, Kurdên azad dive di eniya duyem a ku ji piştê ve tê xencerkirin de têbikoşe. Divê wê xencera di destê PDK'ê de ye û gerîla xencer dike ji dest wan bigire.

Têkoşîneke çawa: Divê hemû kurd li dijî xiyanetkaran bertek nîşan bidin. Divê ew hêza ku xiyanet dike were tecrîdkirin. Di xebatên yekitiya neteweyî de cîh nedin wan. Li başûrê Kurdistanê roj bi roj hejmara kurdên azad zêde dibe. Malbata Barzanî van kesan ji xwe re wek talûkeyeke mezin dibînin. Malbat dixwaze çend kesên li dora wan bi hin berjewendiyan cîh girtine biparêze. Tirsek din li wan peyda bûye û dibêjin, roj were li dora malbatê tu kes nemîne. Ji niha de dibînin ku gelek kes ji wan qût dibin û tevlî nav pêla nû- pêla kurdên azad dibin. Eger di eniya duduyan de, Kurdên azad erkê xwe bi cih neynin û pêşî li vê xiyanetê û xencerkirina ji pişt ve nedin sekinandin, wê gerîla neçar bimîne mûdaxaleyî vê eniyê jî bike. Eger di vî şerî de gerîla bersivê bide xiyaneta wan bila ti kes nebêje ev şerê birakujiyê ye. Na... Ev şer dibe şerê bersivdayîna xiyanetê.